

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Sal: 1984

Hejmar: 15

Zarok jêkiyên malan e.





ŞÊX SEÎD PÎRAN

1925

Xwendevanê birêz

Me di hejmara 14 an ya Kulîlkê de
bi şasîtî li şûna wêneyê Şêx Seîd
me wêneyê birayê wî Şêx Selhedîn
çap kiribû. Em hêvîdar in ku hûn li me
biborin. Em vê carê wêneyê wî yê rastîn
pêşkêşî we dikin

PÊŞGOTİN

Xwendevanên delal

Berî gişî em redaksiyona "Kulîl" ê sersala we ji dil pîroz dikan û hêvî dikan ku, ev sala nû ji bo me gişan serfirazî û serketin be.

Me sala 1984 an li paş xwe hişt, Me heta niha bi rêk û pêk şazdeh hejmarên Kulîlkê derxistin. Bê guman, di vê serketinê de alîkariya xwendevanan jî ne hindik e. Alîkariya we serketina me hêasantir û xurt tir kir.

Di çardeh hejmarên kulîlkê de bêguman pir hindik kêmaniyê me çêbûn. Lê ev nayê wê manê ku wê ev kêmanî her berdewam bin. Em tev zanin ku heta meriv kêmaniya neke, meriv nikare rastiyan jî bibîne. Çaxa meriv nexebite, li mala xwe rûnê û serê xwe bi tiştekî ne-êşîne, bê guman kêmaniyê meriv jî çê nabin. Lê madem me hewl a xebatê daye xwe û em dixwazin ji bo pêşdebirina çand û zimanê xwe bixebeitin, ji ber hin astengan wê kêmaniyê meriv jî çêbibin bê guman. Çawa ku me hewl a xebatê û serketinê daye xwe, wisa jî me hewl daye ku em kêmasiyên me yêñ ku hene ji holê rakin.

Birasti derxistina kovareke çandî weke Kulîlk bi taybetî derxistina kovareke bi rêk û pêk ne hêsanî ye.Eva li ser îmkan û mecalâ meriv e.

Çaxa îmkana meriv di hin waran de kêm be,an ji tune be,çêbûna kêmaniya tiştekî misoger e.Ji vê yekê em hewcedarê alîkariya we ya bi her awayî ne û bi alîkariya we emê kovarekê bi rêk û pêk tir pêşkêşî we bikin.

Sala 1985 a bila ji bo me teva û bi taybetî ji bo doza rizgarîxwaziya netewa kurd serketin û ji bo neyar,dijmin,cahşen xwe firotî,xiniz û kes ên ku doza netewa kurd bi erzanî difroşin mirin û binketin be

Bi silavên germ

K U L İ L K

"Ev çiroka jêrin gava ku ez
piçûk bûm weke ku,ji gelek
zarokên kurd re hatiye gotin
min ji bihîst,,,Lê ez bawer
im iro bêhtir pêwist e ku,ne
piçûk bi tenê lê belê kesên
din ji wê bixwînin û guhda-
rî bikin"

RASTO Û XWARO

Hebû,tunebû xêr û xweşî li dê û bavê min û
we bû.Dibêjin carek ji caran,rehmet li dê û
bavê guhdaran,ji xeynî cendirma-tehsîldaran
û tralên li ber dîwaran!du mirov hebûn,navê
yekî Rasto û yê din ji Xwaro bû.Weke ku ji
navê wan ji dixuye Rasto ji rastiyê û dirûs-
tiyê hez dikir,xwediyyê gotina xwe bû,hevalên
xwe ne dixapand.Lê Xwaro;çıqas dubare çewtî û
tevlihevî hebûna,wî ya qenc ne dikir,rastî ji
qirikê dergediket.

Dibêjin,herdû mirov bûne destbirakê hev û
tim ji hevre digotin:"Rast bi rastiyê de,xwar
bi xwariyê de". Herdiwa qîma xwe bi vê dûriş-
mê anîbûn.

Dibêjin rojek ji rojan Rasto û Xwaro bi hev
re dimeşîyan,herdû destbirak bûbûn rêwî.Rêwî-
tiya wan gelek dirêj bû.Li deşta bi rê ve çûn,
çıya û rûbar li pey xwe hiştin.Riya wan bi
bejayê ket û hêdî hêdî çoleke dûr û dirêj ke-
te ber wan.

Demeke dûr û dirêj li kerbelayê meşîyan,ji hal de ketin û zêde tî bûn,zimanê wan erînekê kişîyan.Li vê çola xalî,ne tu çem,ne tu cobar ne sarin û qolîtk,ne gund,ne şenî ne awayî tu-nebûn.Pir çûn hindik çûn,li ber çavêن wan reş-ve dihat û lîyan û rewrewk digirt,lêvên wan terikî bûn û çeşmûş girtibûn,tav hertim li wan germtir dibû...Ji nişkê ve dîtin ku,sarin-cek li ber wan e.Li dora bîrê çûn û hatin,av li kûr e,satil û çelt tiştek jî tune.Pêwist e ku,yek ji wan,ya Rasto û ya jî Xwaro dakeve sarinc ê avê vexwe û bi kulma xwe yan bi dest-mala xwe bide hevalê xwe jî.

Xwaro gote Rasto:

-Birako,ka dakeve bîrê em ji tîna mirin.
Rasto yek nekir didu daket bîrê av bi destma-la xwe û bi kulma berê da hevalê xwe û paşê têr av vexwar...


Piştî têr vexwarin bêhna wan fireh bû,hişê...
wan hate serê wan,Rasto ji binê bîrê ban kir:

-De birako ka destê min bigre min hilkişîne...

Xwaro:

-Birako,xwar bi xwariyê de,rast bi rastiyê de
diçe.Ê min bi xatirê te;tu li halê xwe bigrî..
û meşya çû.Rasto di binê bîrê de bê çare ma.

Rasto çiqasî di binê bîrê de ma,nizanim,êva-rekê hin deng bihîst.



Window

House
Window
Heval



Cat

Rasto dêna xwe dayê dît ku, şêwreke mezin li
şer bîrê civiya ye.Gur,Sîxur û Rovî li hev
kom bûne,Her sê bi kêf û henek û bi ken rûniş-
tine,yarî û tinaziyêñ xwe dikin.Rasto jî bi bê
hêvîti guhdariya wan dike.

Rovî ji gur pirsî:

-Brakê gur,ti çima hevqasî dikenî,ji kerema
xwe ka sebeba vê kêfxweşîya te çiye?..

Gur:

-Ma ez nekenim wê kî bikene..Kaniya gundê me
çikyaye.Marekî mezin(zîha)ketiye devê kaniyê
nahêle firek av derkeve.Terş û talanê gundiyan
tev tî ne,ava herî mezin qonaxa 4-5 se-etan dû-
rî gund e.Pez û dewar durêzî hevûdû dibin gava
diçin ser avê.Şivan diweste,kûçik tûle dibin,
kîjana dûv-berdayî,qelew li paş dimînin.Ez
êrîş dikim,heta şivan kûçikan hay dikin,diki-
ne heytehût,ez meda xwe distînim,bi xweşî nê-
çîra xwe dibim.Pirê caran berx-berindîr laşen
wan le erdê dimîne ez paşê têm têr dixwim.

Rovî ranaweste(nasekine) ji sîxur pirsî:

-Ka brako,ê te tu çima hevqas dikenî ? va bi-
rakê gur a xwe got,ji kerema xwe tu karibî ji
me re bêjî.

Sîxur dest bi a xwe kir:

-Min qîza paşayê gund dîn kiriye.Paşa kurdünde
ye,tenê ew qîzik jê maye.

Zana û textorêñ welêt tev anîne lê nikarin wê sax bikin. Ger hin av ji ava vê bîrê nebin, keçik xwe pê neşo qet rehet (bijûndar) nabe. Her ku bêhna min teng dibe ez diçim ba qîzik ê, pê he-nekan dikim. Ê min ji ev e....,


Gava Sîxur sebeba kêfxweşiya xwe diyar kir, gur û sîxur zîvirîn ser rovî, jê pirsîn:
-De birakê rovî, vaye me yêñ xwe gotin, ka tu çima hevqas dikenî û kêfxweş i ?

Rovî zimanê xwe li dora devê xwe xist û gote wan:

-Şikeftek di bergefê de ye. Di şikeftê de hin zêr û zîv hene, xwedî ez im. Her dema ku bêriya wan dikim, diçim dihejmêrim, pê dilizim, bêhna xwe bi wan derdixim. Ma ji vî karî xwestir tiştek heye ?...

Herdiwa bi serên xwe bersiv dan rovî. Ken û yariyêñ xwe berdewam kîrin. Piştî kurtepista wan xilas bû rabûn ser xwe ji hev belav bûn. Rasto qenc guhdariya wan kir û digot: "ax!..ax, gelo heye ez ji vir xilas bim ?!"

Rasto çiqasî di sarincê de ma nizanim. Dibêjin karwanek hate ser bîrê. Barêñ xwe danîn da ku rojek didu bêhna xwe derxin. Lewra, bîra ku Rasto tê de maye qonaxa wan deveran ya girîng e, tenê av li wir heye.



10

Bazirgan dest bi çadir û xeybet vekirinê kikirin.Her kes ber bi karê xwe ve beziyan.Yên ardû vedihewîne gün qırş û qala bidne hev,yên singa dikutin rahiştin mîkutan,jinan dest bi hevîr û nanpêtinê(nanpêjanê) kirin,yên ku avê dadigrin çelt û satilêن xwe rakirin û hatin ser bîrê.Saga(yê ku avê amade dike)gava satila xwe avêt bîrê,Rasto hişk bi satilê girt. Rebenê saqa tirsiya,werîsê xwe avêt,bazda kire qêrîn û hewar,bazirgan lê civiyan...

Saqa:

-Tiştek di bîrê de ye,satla min girt hindik mabû ez jî bikşandama ba xwe.

Mêr tev hatin ser devê bîrê û bang kirin:

-Tu çi tebayî kuro,însan î,perî yi tu çiyî ?..

Rasto:

-Ez jî weke we însan im,ez ketim bextê mîrên çê,ka min ji vir derînin.

Gava ku Rasto peyivî,rabûn werîsek anîn li newqa mirovekî girêdan û daxistin bîrê,Rasto û satila xwe derxistin û Rasto birin ba xwedîvê karwan.

Serbazirgan ji Rasto pirsî:

-Lawo xêr e,çîma tu di vê bîrê deyî ? ka mese-la xwe bêje,

Û ban peyayên xwe kir:"lawo ka nan û pêxwari-niyê ji vî camêrî re bînin!"

Rasto dest bi serpêhatiya xwe kir û ji civatê re got.Kêfa civatê tevî ji Rasto re hat,xwarin dan ber wî.Rasto tê xwar hişê wî hat serê wî, serbazirgan jê pirsî:

-Lawo,em tev hevalên rastiyê ne,ka tu çi daxwazê ji me dikî ? bê şerm bêje,çi tiştê qenc ku ji destê me bê em bi paş de nadin.

Rasto:


-Spas dikim,we ez ji bîrê derxistim bes e,mala we hezar carî ava be.

Serbazirgan:

-Baş bêhna xwe berde,emê hin nan û pêxwarin tê-xin tûrkê te,emê şûrekî kerîkotî jî bidin te. Çol kerbela ye ji bo tu xwe pê biparêzî.Û çi gava te xwest cihê te li ser seran û ser çavan heye,de oxira te a xêrê be.

Piştî bêhna wî baş hat ber wî,Rasto xatirê xwe xwest,rahişt şûrê xwe,tûrkê xwe û bi rê ket.

Dibêjin:"Rasto pir çû hindik çû gihişt wî gun-dê ku gur digot zîha ketiye kaniya wî.Rasto berê xwe sererast da kaniyê,bi şûrê xwe dora kaniyê vedâ zîha serê xwe bilind kir,kulora wî ya mezin li hev zîvirî,lê Rasto mefer ne dayê.



Rasto bi hemd û hêl şûrê xwe avêt serê zîha. Serê wî jêkir.Gulofîtka wî hêdî hêdî ji hevûdû vebû,sist bû,wê gavê av herikî.Lê xwîn û av bi hevre diherikî:

Saloxê kuştina mar gihişte gund.Şahî kete nava gund ku kaniya wan der bûye.Lê Rasto nehişt tu kes avê ji kaniyê vexwe,av û xwîna zîha hê ji diherikî.Heta ku av zelal bî Rasto ji nû ve destûra gundiyan da.Pez,dewar,însan û terşê gund tev kişiyan ser kaniyê.Gundi gelek kêfxwes bûn,baskên wan tunebûn ku bifirin.Êdî nema diçûn ava dûr,gur nema terşê wan dixwar,talanê wan nema ji tîna telef dibûn û nexweşî nediket nava piçûk û zarokên wan.

Gundi di nava xwe de civiyan ku,qenciya vî mirovî dê çawa lê vegeŕinin,ango xelatekê(diyyârî)layiqî vî ciwanmîri bibînin û bidinê.

Gundiyan piştî şêwra xwe kirin çund rûspî hatin ba Rasto çavên wî maç kirin,spasî wî kirin û jê re gotin:

-Xortê hêja,brayê delal,te me û terşê me ji belakê mezin xilas kir,em ci bêjin hindik e, em ci bidin te wê hindik be û cihê qenciya te danagire.

Rasto got:

-Ne xêr,ev ne tiştek e,min tenê karê xwe yê

mirovatiyê kir.Lê ku hûn karibin ez ji we tişt-na dixwazim.Kerkê,têrkê,kun û dewlekê bidin min,ev ji bo min baştirîn xelat e.

Gundiyân yek nekir didu,xwestinên wî wê ga-vê bi cîh anîn û jê re gotin:

-Dibe ku tu rojekê têkeve tengayê,haya me jê bike,em gundi tev ji bo her alîkariyê amade ne.

Rasto kera xwe da ber xwe û ji gund bi dûr ket.Lê dûr û dereng dengê dahol û zirnê,dengê heytehûta gundiyân dihate guhêñ wî.

(Dumahîk heye)



TFAQ

Merivekî baş hebû, merivekî nandar bû, deriyê wî her tim vekirî bû. Rojekê çawa dibe ew deriyê xwe digre û diçe. Demsal zivistan bû, ew dizîvire tê. Berf ketibû erdê. Carekê dinere lingekî pêx-was hatiye ber deriyê wî û careke din paş de çûye. Ewî xwe bi xwe got:

"Pihe..lê xwedê mala min xirab ne kirî, iro deriyê min li piştê bû, gelo evê hat birçî bû, gelo xwînî bû, gelo deyndar bû ?"

Hema bi xar dide pey û diçe. Dêna xwe didê wa yek di şikeftê de li ser piştî vezilyaye.

Ewî got:

-Eman bide xatirê xwedê, iro deryê min li piştê bû, tu çima hatî bir derî ? gelo çi ji te re hewce bû ?

Ewê din got:

-Ez dewleta te bûm, hatim ber deryê te, deryê te dadayî bû, ez zîvirîm çûm. Min berê xwe ji te guhert, min dewlet jî hemû tişt jî ji te stand û bir.

Rebeno polîpoşman pişta xwe dayê hate mal û ponijî. Bûka malê şareze û şîrhelal bû, ewê got:

-Bavo, tu çima diponijî ?

-Lawo, hal û hewala min ji vê ye.

-Bavo, bide xatrê xwedê here bêje "me bide xatrê Sems, te dewleta me bir, belê tfaqê bide me (wextê tfaqê bide wê dewletê jî bide)

Kalo bi pey ket û giha nêzîkî wî. Berî ku kalo devê xwe veke, ewî got:

-Here, bila tîr xatirê bûka malê bî, here, min tfaq jî da û dewlet jî da,

HESENÊ ^ USO

ŞERÊ DÎKA

Di wextekî de pîrek hebû,du dîkêñ pîrê ji hebûn,yek spî û yek ji reş bû.Herdû dîkan li hevne dikirin,her tim li hev dixistin.Çaxa pîrê xwarin dida wan,dîkê spî diqîriya û digot:

-Çima xwarina min hindik e ?

Û dîkê reş ji digot:

-Lê tu çima tenê min dikwî ?

Bi vî awayî şer di navbera wan de dest pê dikir.

Carekê pîrê derket dervayî malê,dît ku herdû dîk li hevûdû dixin.Pîrê ponijî û got:"gelo ez ci bi van dîkan bikim ?" Pîrê rabû lome û şîret li wan kir,piştre herdû dîk hêmin bûn û her yek li şûna xwe rûnişt.Pîrê ew berdan û hate malê.

Piştî pîrê çû herdû dîka cardin bi awirêñ bira-kuji li hev nerîn û xwe dadan hev û şerekî dij-war di navbera wan de dest pê kir,Ji herdû dîkan ji pir perî weşyan û ji hal de ketin.Rabûn çûn cem pîrê û gili li hev kirin.

Dîkê spî got:

-Pîrê pîrê.,dîkê reş geleki li min xist,binere per û baskêñ min tev birîn kirin

Dîkê reş ji bersiv da:

-Pîrê ji wî bawer meke,yê ku li min xist ew bû, wî ez pir êşandim

Bêhna pîrê pir teng bû,wê tiştek negot.Hema dîkê reş qirt kir bin çengê xwe û ew bir cihekî nenas.

Dîkê reş di bin çengê pîrê de ponijî û got:
"Dibe ku pîrê ji min şîvekê xweş çêke"

Pîrê dîk bir cem cîrana û sê roj û sê şevan ew li wir hişt.

Dîkê spî bêzar ma, arama wî (sebra wî) bi tenê
nehat, pir aciz bû, ne xwar û ne vexwar.

Sê roj derbas bûn, di roja çaran de dîkê spî
ji pîrê re got:

-Pîrê, dîkê reş bîne cem min, sebra min bi tenê
nayê û ez peymanê (sozê) didim ku ez carek din
bi wî re şer nekim

Pîrê got:


-Pir baş e, ger wisa be ez ê wî bînim. Lî bila
hûn zanibin ku hûn cardin şerê hev bikin ez ê
ji we herdiwa şîvekê xweş çêkim

Piştî van soz û peymanan pîrê dîkê reş anî
mal. Herdû dîka hevûdû hembêz kirin, maç kirin
û soz dan hev ku carek din li hev nexin.

Bi vî awayî dîkê spî û dîkê reş bi hevre
di bin ala aşitiyê de jiyan û pîrê jî ji wan
pir hez kir.

(Ji rojnama nûçeyên Mosko)

KARDOX



PÊKENÎN

ATATIRK

Rojekê Atatirkê Tirka birtyar dide ku biçe nava gund û bajaran bigere binere bê rewşa rûniştvanen gund û bajêr çawan e. Atatirk û peyakî xwe derdikevin û li nava xelkê digerin.

Ha li vî gundi, ha li gundê din, Atatirk û peyayê xwe diwestin.

Atatirk ji peyayê xwe re dibê:

-De ka em biçin li dibistanekê rûnin, hem em ê binerin bê şagirt hînî ci dîbin û hem jî em ê bêhna xwe berdin

Peya:

-Wey ser serê min paşayê min

Rabûn herdû çûn dibistanekê ji yê welatê kurdan. Çaxa Atatirk kêt hundirê dibistanê, zarokîtev ji ber rabûn ser xwe û cardin rûniştin.

Atatirk di hundirê dibistanê de çû û hat. Weke ku em tev dizanin çavên Atatirk şîn in. Tu nabê di dibistanê de jî şagirteki çavşîn heye. Çawa dibe bala Atatirk dikşîne,

îcar Atatirk diponije û dibê:

"Weyyyyy!. çavên wî jî şîn in kuro, ev heye neye diya wî hatiye bajarê Stenbol ê cem min!"

Atatirk ~~xwe~~ nagre, hema diçe cem şagirt û jê dipirse:

-Oxlim(kurê min) ma diya te qet çûye bajarê Stenbol ê ?

Şagirt daxwaza Atatirk fêm dike û dibê:

-Na efendim, lê bavê min gelek caran çûye Stenbol ê!...

Rûyê Atatirk bi carekê tîrs dibe, fişefîş lê dikeve û serî di ber de derdikeve û diçe.

BRÎNDAR

ŞİRETÊ BAVÊ

Merivek hebû, gelekî kal bû
Nêzîkî heftê û heştê sal bû
 Zanî bû ew ê koçke ji dinê
 Bende ku heye salê mirinê
Bê kê re maye ev dinya rengîn
Mirin ji hemya re tê, dibe xwazgîn
 Wi kali gazi qewm-pismama kir
 Go:"dinê tune tu evdê nemir
Go:"yek dimire û yek jî dibe
Qanûna dinê her tenê ev e...
 Go:"hûn guh bidine evî giliyê min
 Hetanî hene rû dinê dijmin
Qeweta însen tenê tifaq e
Top û tifing jî tiştkî pê nake
 Go:"herin ji min re gurzek şiv bînin
 Ku hûn neynesiya giliya bibînin
Û ewana çûn gurzek şiv anfn
Kalo yeko yek şiv jê deranîn
 Li wira ewî gazi zarwa kir
 Go:"bişkin şiva yeko yeko li vir"
Û derbasnebû hela hê deqek
Şiv şikenandin zarwa yek bi yek
 Go:" virde were lawkê pêhlewan
 fcar tu bişkin gurza şivê han
Ewî lawkê zor, lawkê pêhlewan
Kir nekir , neşkest gurzaşivşilan
 Kal got:"gurzê heyî ew tifaq e
 Hezar pêhlewan tiştkî pê nake
Go:"wexta hûn jî bi xwey tifaqbin
Tucar bin nakin we nemam û dijmin..."

Xelîlê Çaçan Mûradov

Z İ N D A N

Her tişt bi sebrê dighêje hedef
Di binê zîndanê de em birijin tev
Têne ziyareta me em nagihijin hev
Welat,ji bo te dimrim bi kuştin û bê rev

Van xortên ciwan di binê zîndanê
Gava ku dihatin işkence didanê
Digot "Hesen,bike qîr li xortên cîhanê
Min go"deng nemaye ji zilm û lêdanê"

Bi lêdana xwe dixwazin me bikujin
Her rojê carek xwînê dirêjin
Ma qey hûn ditirsin ji min re bêjin
Wa ye li cîhanê methê me dibêjin

Zîndana mèzin **ya** Diyarbekir
Lêdana cendirma xwîn li min der kir
Li min ne tehl bû,wek şîr î sekir
Ji bo welatê min get tesîr li min nekir

H E S E N

K U R D I S T A N

Li te bûye tarî û şev
Te nedît ro, ne jî tev
îlm û xwendin li te bûye hesret
Wetenê te ye, lê dijmin dibîne lezet

Kurdistana min ava çeman
îro bûye çevkaniya xeman
Kanî kengî wê çêbe Kurdistan
Lê hêşîn be bax û bistan
Hilşe dîwar û dijmin binde bimîne
sefil û jar

MÛSA Û TEMO



Çivîka çûkê

Vê sur û sermê fêza bênderê
Çivîka çûkê danî li ser darê

Berî êvari ba vize vize
Çûkê li ser darê ha dilerize

Soldirû rabû û gote terzî:
Va çûk şewitî pêxwas û tazî

Soldirû cotek sol dirû anî
Terzî destek kinc li ber çûk danî

Çûk hînga terez lez sol pê kirin
Kincê xas, teze li xwe werkirin

Çivîka çûk ê wê ji xwe re bigere
Delalê bûk ê wê bifire here

Çûk nikarî bû hîç gava bike
Çûk nikarî bû baskên xwe veke

Çûkê piçûkê dike gazina:
"Ev sol giran in! ev kinc mezin in
Ew ji çî mîn re ne ?



Mîkayêlê Reşîd



P È Z A N Î N

Pirs: 1

-Bi gelek zimanan "telewîzyon" dibêjin,gelo bi zimanê kurdî çi dibêjin..?

Bersiv:(.....)

Pirs: 2

-Bi gelek zimanan "radyo" dibêjin,gelo bi kurdî çi tê gotin..?

Bersiv:(.....)

Pirs: 3

-Zimanê kurdî(zaravê kurmancî) ji çend tîpan pêk tê..?

Bersiv:(.....)

Pirs: 4

-Li bakurî Kurdistanê navê çiyayekî ku,jê bilind tir nîne..?

Bersiv:(.....)

Pirs: 5

-Navê padîşahekî kurd ku bi taybetî ji bo misilmantiyê xebitiye

Bersiv:(.....)

Pirs: 6

-Bi Tirkî "verem" û bi gelek zimanê ewrûpi
"tuberkulos" dibêjin, gelo bi kurdî navê vê nex-
weşiyê çi ye ?

Bersiv: (.....)

Pirs: 7

-Navê evîndarekî kurd ku, ji bo hezkiriya xwe
çiya qul kiriye..?

Bersiv: (.....)

Pirs: 8

-Ji golkê nêr re çi tê gotin ?

Bersiv: (.....)

Pirs: 9

-Di sala 1938 an, sala 1947 an û di sala
1975 an de çi bûyêr li kurdistanê çêbûne ?

Bersiv: (.....)

S E İ D È ADO

Li gundekî cotkarekî pir jêhatî hebû, navê wî Seîdê ado bû. Ev cotkar serê siba ji mala xwe derdiket erdê xwe cot dikir an jî zeviya xwe eşêf dikir û ber êvarî jî vedigeriya ma-la xwe.

Seîdo gelek mirîşk bi xwedî dikirin, her mi-rîşkek wî jî pênc kîlo derdiket, Seîdo gelek hej mirîşkên xwe dikir.

Rojek ji rojan rovî bi mirîşkên wî hay dibe.

Her êvar dengê Seîdo li nava gund belav dibû û digot: "lawo rovî hat, bêxwedîkê rovî hat, he-war..." Lê rovî her êvar nêçîra xwe ji koxa mirîşkên Seîdo dibir.

Şevekê hîv li nava ezman e, zilamên gund li ser banê xaniyan rûniştine û diaxivin. Ji niş-kê ve bû heytehûta Seîdo û got jina xwe: "keçê ka çewalekî werîn rovî kete koxê" û ji alîkî jî ban zilaman dike: "kuro ka hûn werin, hûn ê îro derbê mîran bibînin!"

Zilamên gund tev li mala Seîdo kom bûn. Seîdo çewal daniyê ber devê koxê, rahiştîye darekî mezin. Seîdo ji zilaman re got:

-Hele hûn ji kerema xwe destê xwe li koxê xin vî mîratî xwîn berdaye dilê min. Ma wê vê carê bi ku de biçe, ezê xwîna wî vexwim



Çewal ji devê koxê derxistin û bû kop kopa zilaman destên xwe li koxê xistin.Qertawert bi mirîşkan ket.Ji nişkê ve mirîşkekê ji koxê bazda Seîdo hema heta jê hat darek li pepûka mirîşkê xist,waqîniya wê di felekan re derxist

Seîdo pir aciz bû.Lê zilamên gund jî tev pê dikenin.

Seîdo cardin got zilaman:

-Kuro hûn cardin destê xwe li koxê xin,wele ezê vê carê mîjîyê wî bi dîwaran ve bizeliqînim.

Bû kulpe kulpa zilaman û cardin qertewert bi mirîşkan ket û cardin mirîşkekê ji koxê bazda.

Seîdo hema heta jê hat darek li bin guhê mirîşkê xist,ew totlanî hev kir.

Zilamên gund êdî ji kena nema xwe digrin.Lê agir bi nava Seîdo dikeve.


Seîdo cardin got:

-Kuro hûn cardin destan ji min re li koxê xin,ma ev çend û çend..

Zilaman cardin destên xwe li koxê xistin û qertewert bi mirîşkan ket,ji nişkê ve mîratê rovi bazda.Seîdo ji tirsa mirîşkan vê carê darê xwe ne ceriband.Bi vî awayî roviyê jîr xwe ji nav lepê Seîdo xilas kir.

KAWA

Bûlgarîstan



ÇİMA BAVO

Çima bavo ez sêwî me
Ma qey dayika min nîne
Bêje ma ka dayika min
Ma em tev çima sêwî ne

Te agir berda nava min
Te hêstir berdan çavên min
Te pir kir kul û derdên min
Çibkim dayka te bindest e

Dayika min î bê mecal
Bi kul û derd û bi zewal
Bêje bavo ma ev ci hal
Bêje ma ka dayika min

Çibkim dayka te ket bindest
Ji destê dijmin û zordest
Ji bo em nemînin bê kes
Wê xelaskin tev ji bindest

Bo dayka xwe bikin xebat
Ji bo rizgariya welat
Şiyar bibin roja me hat
Ji bo em tev bibin felat

Dayika te pir dinale
Ji derdê bindestiyê re
Dixwaze ku bibe felat
Bibe dayik ji gelê xwe re

1979



MÛLİD

Rojekê du heval bi hevre digerin,yek ji wan kurdeki zana ye. .

Hevalê wî jê re dibê:

-Wele sibê mûlidek li mala me heye,hema tu jî wer mûlidê.

-Na lo,ez naxwazim bi wan sofî û melan re têke-vim gotûbêjê.

-Na,bi xwedê gerek tu bê,yana ez ê ji te aciz bibim.


Adinî rojê yê Kurd diçe mûlidê.Ewan jî melayê bajêr anîne.Melayê bajêr jî yekî Tirk e.

Melayê Tirk dest bi şîret û amojgariyan dike:

"Gelî civatê,gelî mirîdên dînê îslam ê..misilman hemû birayêن hev in,gerek misilman tadê li hev nekin,alîkarî û piştgirtiya hev bikin,mafê hevûdû biparêzin.Gerek her miletê misilman bibe xwediyê mafê xwe û doza dînê îslam ê berûpêş bibe."

Civat tev serê xwe dihejînin,tu kes dengê xwe nake.Yê kurd destûrê distîne û diaxive:

-Rast e,gotina seyda ye.Gerek miletêni misilman tev li hev xwedî derkevin,mafê hev biparêzin Her weha hemû kes û mirovêن qenc jî destêni xwe bidin hev û li dijî xirabî û neyarêni xwe şer bikin



Divê hemû mirov bidin ser riya qenciyê, bidin ser riya mirovatiyê.

Seyda carê dibê:

-Bijî,bijî..gotinên te ji quranê ne

Yê kurd berdewam dike:

-Lê mixabin em dibînin hin milet hene piraniya wan misilman in,lê belê bê maf in,ji her tiştî bê par in,bi ser de kes weke wan dînê islam ê naparêzin,

Seyda:

-Wehhhhh...ev çi neheqiyekê şermîzarî ye,dînê islam ê vê napejirîne(qebûl nake),

baş e, kîjan milet e ev miletê bê maf mayî ?

Yê kurd dibê:

-İro miletê Kurd bi piranî misilman in,lê bê maf e.


Ruyê mele bi carekê tîrş dibe,çavêن wî sor awirêن wî tûj dibin û dibê:

-Haşa,haşa,dev ji kurdan berdin.Ev gotin di quranê de nînin,Yê qala kurdan bike kafir e, bê dîn e bê iman e, ev gotin li dijî dînê islamê ne. Estexfurillahî li ezîm

Mele hema qûna xwe dawşand û bi lez ji civatê derket û çû

BRİNDAR

XAÇEPİRS



Ceperast:

- 1-Navê welitekî li rojhilata navîn
- 2-Yar(berepaş)şêni,geşî
- 3-Navê darek ê....çaxa heywan dizên(berepaş)
- 4-Ji "rûsan"re dibêjin
- 5.....
- 6-Bersiva qenciyê...derbasbûyîna gotina"hebûn"ê
- 7-Ne şev(dijberê şevê) ...ji agir re dibêjin
- 8-Qedir,giymet,rêzdarî...,
- 9-Ji yên ku dewletê dimeşînin re tê gotin.... ne jin(dijberê jin ê)

Serejêr:

- 1-Navê padîşahekî kurd ên kevn..,
- 2-Li hinek ciyan ji zik re tê gotin...çaxa me- riv ban apê xwe dike

3-Mağ, maçî kirin

4-Li hinek ciyan ji xurbetê re dibêjin,,,çaxa
meriv serê siba zû diçe kewan

5-Ne zêr e,,,piçûk

6-Talda meriv(çaxa ro dertê şiklê meriv li er-
dê çê dibe)....bingeh,esas

7-Tiştékî dirütinê,,,pirhejmara kesemînên ye-
kem

8-Şenî,geşî....di meha sbatê de

9-Navê keçekte kurd,,,ji ser û çavêñ meriv re
tê gotin (**berefagî**)

Bersiva xaçepirsa hejmara 14 an

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | N | E | W | R | O | Z |
| 2 | A | G | I | R | | O |
| 3 | L | E | S | | A | R |
| 4 | T | R | E | Z | | D |
| 5 | N | | | A | V | A |
| 6 | G | I | R | A | R | |

www.arsivakurd.org

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA